Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1063 | 10-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Mihrîcana Çanda Kurd a Parîsê

NAVENDA NÛÇEYAN

**Mihrîcana Çanda Kurd a Parîsê ya 2'emîn ku wê heta 12'ê Gulanê bidome, dest pê kir. Senatorê Parîsê Remî Feraûd di vekirinê de axivî û got: "Şaredariya Parîsê ya 10'emîn mala kurdan e. Li şaredariyê pêşwazîkirina merasîmeke wiha, rûmet e."**

Ji bo kesên ku bixwazin çanda kurd, mitbexa kurd, Senatorê Parîsê Remî Feraûd, Senatora Partiya Komunîst Laûrence Cohen, Endamê Meclîsa Parîsa 10'emîn Elîe Joûssellîn, Seroka France Kurdistanê Sylvîe Jan, Serokê Acortê Umît Metîn, nûnerên saziya Keldanî, Federasyona Jinan a Kabîlê, Actît û rayedarên Şaredariya Sarcelles jî di nav de gelek siyasetmedar li salonê cihê



Şano û lîstokên herêmî yên kurdî bizanibin, wê vê yekê di mihrîcana Çanda Kurd a Parîsê ya 2'emîn de bi rengekî hîn baştir bibînin. Mihrîcan diyarî Evîn Goyî, Mîr Perwer û Abdûrrahman Kizil hat kirin û mihrîcan li serê nêrdewanên ku ew lê hatine qetilkirin, dest pê kir. Di destpêka merasîmê de nûnerên saziyên Kurdistanê, muzîkvan û komên foklorê ji Navenda Civaka Demokratîk a Parîsê hetanî avahiya Şaredariya Parîsê ya 10'emîn meşeke çandî li dar xistin. Xwepêşandan li herêmê rastî eleqeyek mezin hatin.
Vekirina mihrîcanê ku hem li navenda paytextê û hem jî di gelek komunên li herêma Parîsê de merasîman digire nava xwe, li Şaredariya Parîsê ya 10'emîn pêk hat. Li ser ekranê wêneyên Evîn Goyî, Mîr Perwer û Abdûrrahman Kizil hatin nîşandan û li ber wê re jî stranên Mîr Perwer hatin guhdarkirin. Li ser navê CDK-F'ê Bêrîvan Firat mafê axaftinê girt û mêhvanên li salonê silav kir. Firat anî ziman ku mihrîcan diyarî şehîdên Parîsê hatiye kirin û piştre têkildarî çanda Kurd hinek mînak dan.

xwe girtin.
Remî Feraûd kurt axivî û got: "Şaredariya Parîsê ya 10'emîn mala Kurdan e. Li şaredariyê pêşwazîkirin merasîmek wiha, rûmet e."
Di bernameya vekirinê de koma Govendê ya Rojbîn a Parîsê, Meral Alkan û Ûlaş Kelaşîn derketin ser dikê.
Her wiha şaredariyên Sarcelles û Bobîgnyê jî ji bo aktîvîteyên mihrîcanê cih dan.


**Bernameya mihrîcanê**

Li gorî bernameyê vekirina roja destpêkê û roja duyem, wê li Komeleya Kurd taştê bê dayîn. Roja piştre, li banliyoya Sarcellesê wê şanoyek bê lîstin.
9'ê Gulanê li banliyoya Bobîgnyê wê dengbêj şeveke muzîkal lidar bixin.
10'ê Gulanê ji bo zarokan wê anîmasyon û belgefilma "Darên bi tenê" bê pêşandan.
11'ê Gulanê wê bi temaya "Jin Jiyan Azadî" pêşengeh bên vekirin

12'ê Gulanê li navenda Parîsê wê Koma Bajar, Mehmet Atli û Rûken Yilmaz wê konsera fînalê bidin.

# Lehengiya şervanan vedibêjin

Hunerê wênesaziyê ew huner e ku di çarçoveya qaîdeyên estetîk de hest, raman yan jî hesretê bi xêz û rengan nîşan dide. Ji bo ku wêne were çêkirin, divê tevger, ronahî, reng, cih û hecim hebe. Wênesazên jin ên Kantona Kobanê Rojîn Reşê Mîrvan û Nûrcan Omer Hecî têkildarî rêwîtiya xwe ya ber bi wênesaziyê ve axivîn.




**Ji bo civakê em xebatê dikin**

Wênesaz Rojîn Reşê Mîrvan anî ziman ku, ew ji zaroktiya xwe ve elqeyeke mezin nîşanî wênesaziyê dide û got, "Gelek biçûk bûm, dema ku min wêne xêz dikirin. Wênesazî hunerekî ku mirov hestên xwe yên xemgînî yan jî kêfxweşiyê tîne ziman. Ez niha jî hewl didim ku di wêneyên xwe de çanda Kurdistanê zindî bikim û lehengiya ciwanên Kurdistanê ya li dijî çeteyên dagirker têdikoşin, xêz bikim."
Mîrvan destnîşan kir ku, bi saya felsefe û ramanên Rêber Abdullah Ocalan jin zincîrên koletiyê yên pergala desthilatdariya mêr qetandine û got, "Jinan di her warê jiyanê de îsbat kir ku ji pênûs girtinê heta rakirina çekan, serî rakir û ji bo azadiya xwe dest bi têkoşînê kir. Divê em weke wênesazan bi tablo û hêza firçeyên xwe ji bo avakirina civaka demokratîk xebatê bidin meşandin."

**Bi wênesaziyê em êşên civakê didin**

Wênesaz Nûrcan Omer Hecî derbarê rêwîtiya xwe ya wênesaziyê de got, "5 sal in ez li Navenda Çand û Huner a Baqî Xido bi beşa wênesaziyê re mijûl dibim. Armanca min ew e ku, ez bibim wênesazeke bi nav û deng. Ez dixwazim çand, êş û azara civaka xwe bi rengên wê yên dîrokê derxim pêş." ANF

Sudoku: Bersiv 72


| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 5 | 1 | 8 | 3 | 4 | 7 | 2 | 9 |
| 3 | 8 | 7 | 6 | 2 | 9 | 5 | 4 | 1 |
| 4 | 9 | 2 | 5 | 1 | 7 | 3 | 8 | 6 |
| 1 | 2 | 4 | 9 | 8 | 3 | 6 | 5 | 7 |
| 8 | 6 | 3 | 7 | 5 | 1 | 2 | 9 | 4 |
| 9 | 7 | 5 | 4 | 6 | 2 | 8 | 1 | 3 |
| 2 | 3 | 9 | 1 | 7 | 5 | 4 | 6 | 8 |
| 7 | 1 | 8 | 2 | 4 | 6 | 9 | 3 | 5 |
| 5 | 4 | 6 | 3 | 9 | 8 | 1 | 7 | 2 |

Sudoku:Pirs 73

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 8 | | 3 | | | 2 | | |
| 2 | 9 | | | | 6 | | | |
| | | | | | | | | 5 |
| | 4 | | | 6 | | 5 | 1 | |
| 3 | 1 | | 5 | 9 | 8 | | 4 | 6 |
| | 7 | 6 | | 4 | | | 2 | |
| 7 | | | | | | | | |
| | | | 4 | | | | 3 | 2 |
| | | 1 | | | 5 | | 7 | 9 |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Afirandin** | **Xuliqandin, çêkirin, peydakirin, sazkirin.** |
| **Bertek** | Bersiv, cewab, nerazîbûn, neqayîlbûn. Gotinek yan kirinek li dijî gotinek yan kirina kesekî: Kurdan li dijî girtina nivîskarê Kurd bertek nîşan dan. |
| **Darizandin** | Mehkemekirin. |
| **Gengaz** | Tişta dibe ku bibe, tişta bûyîna wê ne diyar. |
| **Nirx** | 1.Biha, qîmet, fiyet, heq. 2.Tiştên girîng yên pîroz: Nirxên neteweyî. |
| **Şîrove** | Nêrîn û ramanê li ser mijarekê. Hevserok mijar baş şîrove kir |
| **Pejirandin** | Qebûlkirin, razîbûn, qayîlbûn: Gelek tişt xwestin lê min tev nepejirandin |
| **Pêdivî** | Tişta lazim, tişta ku divê hebe yan bê kirin, pêwîstî. Pêdiviya me bi erebeyekê heye |
| **Pêkan** | Mûmkin |
| **Pêwîstî** | Pêdivî, tişta lazim: Pêwîstiya me bi gelek tiştan heye |



# Kompilo Û Tecrîd Nikarin Felsefeya Rêber Ocalan Ji Holê Rakin

Girêdayî bêdengiya navnetewî di derheqê tecrîda ku li ser Rêber Ocalan tê meşandin. Berdevka Kongira Star û endamê saziya malbatên Şehîdan a kantona Qamişlo anî ziman ku, di şexsê Rêber Ocalan de dixwazin îradeya gel bişkînin û gotin "Rêber Ocalan felsefeya jiyana me avakir, wê ev gel heyanî serkeftinê di vê felsefê de bi îsrar be."R-5

## Festîvala Orkêş ya 2'yemîn wê bi beşdarbûna 24 komên hunerî were li darxistin




Bi diruşmeya "Bi Dengê Pîroz Şoreş Ava Dibin" û bi tevlîbûna 24 komên hunerî, wê 2` yemîn Festîvala Orkêş a Hunerî di 11'ê Gulanê de li Navenda Mihemed Şêxo a Çand û Hunerê a bajarê Qamişlo were lidarxistin.R-7

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1063 | 10-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# EM BI HEVRE DAWÎ LI FAŞÎZMA AKP – MHP'Ê BÎNIN

Endama Komîteya Rêveber a PKK'ê Hêlîn Umît diyar kir ku, ev hilbijartin wê ji bo her beşê civakê bibe destpêkek nû û got "10 sal in em şerê hilweşandina faşîzma AKP-MHP'ê dimeşînin. Eger wê îro hilweşe, ev yek wê bi destê kurdan û hêzên demokrasiyê, rêya sêyemîn wê faşîzmê hilweşîne."**R-3**




## "Insiyatîfa Rêveberiya Xweser Bingeha Çareseriyê Ye"



Gulîstan Elî diyar kir ku Insiyatîfa Rêveberiya Xweser a ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê bingeh e û riya yekane a çareseriyê ye. Herwiha da xuyakirin ku ew ji bo pêşwazîkirina penaberan amade ne û wan ji bo wê bang li Netewên Yekbûyî kiriye ku bibin alîkar.R-4

## Amadekariyên Wergirtina Berhemên Çandiniyê Dewam Dikin



Li bakur û rojhilatê Sûriyê Çandinî ji bo gelên herêmê jêdereke bingehîn e. Desteya Çandiniyê a herêma Cizîrê amadekariyên ji bo wergirtina berhemên çandiniyê ji cotkaran bê navber dewam dike.R-6

## Hêvênê Şoreşa 'Jin, Jiyan, Azadî': Kemanger, Elemhulî, Heyderyan, Wekîlî û Îslamyan



Ew li hemberî hemû zilma rejîma Îranê, di şert û mercên herî zehmet de, li girtîgehê li ber xwe dan. Ew bûn hêvên şoreşa 'Jin, Jiyan, Azadî' ku îro bi hezaran kes ji bo azadiyê li qadanin. Kemanger, Elemhulî, Heyderyan, Wekîlî û Îslamyan, pênc şoreşgerên azadî û rêya serkeftinê.R-2

## Çiya Kurd: Dozên hevbeş ên Rêveberiya Xweser û dewletên Ereban hene



Bedran Çiya Kurd destnîşan kir ku ew destekê didin hewldanên dewletên Ereban ên ji bo çareseriya Sûriyeyê û bal kişand ku di navbera rewşa Sûriyeyê û dewletên Ereban û di navbera Rêveberiya Xweser û dewletên Ereban de dozên hevbeş hene ku dikare bi hev re li ser kar bikin.R-3



YEKÎTIYA EREBAN DIKARE REWŞA SÛRIYÊ BIGUHERE
DILYAR CIZÎRÎ R-4

Lêgerîna Çareseriya ku xwe dispêre qirkirina Kurdan
Zekî Bedran R-5



Dawiya Kartela Erdogan
Farûk Sakik R-5

# Amadekariyên Wergirtina Berhemên Çandiniyê Dewam Dikin

Li bakur û rojhilatê Sûriyê Çandinî ji bo gelên herêmê jêdereke bingehîn e. Desteya Çandiniyê a herêma Cizîrê amadekariyên ji bo wergirtina berhemên çandiniyê ji cotkaran bê navber dewam dike.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

li gor Desteya Çandiniyê ya herêma Cizîrê rûbera erdên belgekirî îsal giha 3 melyon û 200 hezar donim ku li herêmê hatine çandin, 2 melyon û 100 hezar jê zeviyên avî ne, her wiha meliyonek û 450 donim genim lê hatiye çandin .
Hêjayî gotinê ye ku ji bo parastina zeviyan ji şewatê, Komîteyek hatiye çêkirim û wê li hemû cihên hatine terxandin, hertim di tevgerê de bin. Herwiha bi nêzbûna dema çinîna zeviyan re, Rêveberiya Xweser û welatiyên bakut û rojhilatê Sûriyê êdî xwe ji bo vê yekê amade dikin, di heman demê de Rêveberiya Xweser ji niha ve pêdiviyên pêwîst, weke parastina zeviyan ji nexweşiyên curbecur ji cotkaran re pêşkêş dike. Desteya çandiniyê wê heyanî welatî berhemên xwe bi dest dixe wê kêlî bi kêlî di nava tevgrê de be.
Di derbarê amadekariyên herêma Cezîrê ji bo bidestxistina berhemên şandiniyê, Hevseroka Desteya Çandinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Leyla Saroxan ji me re axivî.



**‘Bi nêzbûna mewsimê amadekariyên baş hatin kirin’**

Leyla Saroxan di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku ji bo mewsim amadekariyên pêwîst hatine kirin û wiha domand:” Ev bûn çend sal in ku baran bi rengekî têrker li herêmê nebariya ye, lê îsal heya astekê baran baş bariya û niha zeviyên avî û yên bejî herdu baş in. Herwiha di demeke nêz de, wê ev zevî werin çinîn, lewma em ji niha ve amadekariyên xwe dikin.
Hêjayî gotinê ye ku ji bo pirsgirêka şewatê ya ku zeviyên herêmên me dişewitîne komîteyek li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye çêkirin û hêzên ASAYÎŞÊ, Cewherî, endamên şaredaraiyan û Tevgera Ciwanan di nav vê komîteyê de cihê xwe digrin, her wiha me ji bo parastina zeviyan ji şewatê piroşorên hişyariyê li ser welatiyan belav kir.

**`Şopandina zeviyên genim ji nexweşiyan`**

Her wiha Leyla anî ziman ku nexweşiyên ku derdikevin bandora xwe li ser berhemdayînê yekser dikin û wiha got: “Pêvajoya xwedîkirina cureyên ku hatine çandin gelekî hesas e, ji ber wê yekê nexweşiyên ku derdikevin di vê demê de yekser bandora xwe wê li ser berhemgirtinê bike. Anha nexweşiyek ji kêza Sûnê li genim xistiye, bandora wê gelekî li berhemdayîna genim dike û ji ber vê yekê me desteyek terxand da ku rewşa zeviyên genim bişopîne û wan derman bike.”

**‘Amadekariyên Çinînê û Wergirtina berheman di nav pilanê de ne’**

Hevseroka Desteya Çandinê ya Desteya Çandiniyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Leyla Saroxan di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku navendên girtina genim, ceh û hwd amade ne û karê deraseyan wê bikeve rêk



û pêkiyê de û wiha got:” Di salên derbasbûyî de xwediyê deraseyan ji bo wergirirtina mazotê rastî astengiyan dihatin, lê niha bi awayekî sîstemkirî mazot li wan tê belavkirin. Her wiha ji bo bihayê çinîna zeviyan jî wê li gor rewşa cotkar e ku donima zeviyên avî û bi berhemdayî kayê 35 hezar leyreyên Sûrî ne û bêyî kayê 30 hazar e, herwiha zeviyên bej jî yên derase kayê çêdike buhayê her donimekî 20 hezar e û bêyî çêkirina kayê 15 hezar leyreyên Sûrî ye. Her wiha di derbarê wergirtina me ji berhemên ku hatine çinîn re, me li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê 24 navend yên wergirtina genim, ceh û hwd… hatine terxandin û cotkar dikarin bi hêsanî berhemên zeviyên xwe bifroşin van navendan.”

# “Parastina bexçeyên bajêr erkê tevahiya welatiyan e”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Welatiyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku bexçeyên giştî ji bo behnvedana welatiyan û bi taybetî ji bo zarokan cihkî pir girîng e û gotin”Parastina bexçeyên bajêr ne tenê erkê şaredariyê ye, lê erkê her welatiyekî ye.**

Bexçeyên di nava bajaran de, ji bo bêhnvedana welatiyan cihkî girînge, herwiha ji ber hebûna daran û şînahiyê di nava bexçeyan de, rola wê di pakirina atmosfêrê de sereke ye. Welatiyên bajarê Qamişlo jî, ji bo bêhnvedanê û dûrketina ji qerebalixa bajêr, berê xwe didin bexçeyan. Lê hin bexçe ji ber kêm baldariyê, şînatî tê de kêm e, dar hişk bûne û pêlîstokên zarokan jî têk çûn e.
Derbarê rewşa bexçeyên bajarê Qamişlo, welatiyên bajêr û Rêveberiya Mekteba Ekolojîk ya Şaredariya bajarê Qamişlo ji rojnameya me re axivîn

**` Rewşa baxçeyan bi giştî baştir bûye `**

Welatiyê bi navê Mehmûd Xemîs diyar kie ku rewşa bexçeyan baştir bûye û wiha got: “Ez ji salên borî ve diçim bexçeyan û dibînim ku di van du salên borî de, rewşa baxçeyan bi giştî baştir bûye, wek şaredariyê û karkerên wê jî, bi erkê xwe yê baqijkirin û şopandinê radibin. Herwiha darên hişkbûyî radikin û li şûna wan darên nû diçînin.”

**`Pêwîste pêdiviyên bexçeyên biçûk jî werin pêşkêşkirin”**



Mehmûd Xemîs da zanîn ku hin baxçeyên biçûk pêdiviya wan bi baldariyê heye û axaftina xwe wiha qedand: “Li bajarê Qamişlo gelek baxçeyên biçûk yên di nav taxan de hene, malbat zarokên xwe ji bo bêhinvedanê dibin van beçeyan, lê rewşa wan bexçeyên biçûk baş nayê şopandin, herwiha pêwîstiya wan bi gelek pêdiviyan heye.”

**`Nebûna û kêm bûna berpirsiyariyê`**



Welatiyê bi navê Mihemed Silêman Elcasîm jî, derbarê rewşa bexçeyan ji rojnameya me re axivî û wiha got: “Pêlîstokên li bexça giştî a li bajarê Qamişlo, ji bo zarokan bûne cihê metirsiyê, ji ber ew pêlîstok tevahî



têkçûna û dibe ku zerarê bighîne zarokan, gelek caran ev pêlîstok bûne sedema birîndarbûna zarokan. Nebûn û kêmbûna berpirsyariyê di aliyê parastina bexçeyan de di nava welatiyan de pir kêm e. Parastina bexçeyan erkê her kesî ye û divê her kes berpirsyar bibîn e.”

**` Hejmara Bexçeyên mezin zêde bikin `**

Jina ciwan ya bi navê Mizgîn Şêxo da xuyakirin ku ew di wê baweriyê de ye ku şaredarî bi hemû hêza xwe karê xwe dike û got: “Li bajarê Qamişlo bexçeyên mezin tune ne, her wiha gel bi hijmareke girsayî komî li bexçeya Qamişlo a giştî kom dibin. Ev yek jî debe sedema qerbalixeke pir mezin û derketina kêmasiyan. Em di wê baweriyê de ne ku şaredarî bi erkê xwe radibe û li gorî derfetên xwe dibe bersiv. Eger ruhê hevkariyê di warê paqijî û xwedîderketina li cihên giştî de hebe, wê tevahî pirsgirêk çareser bibin.”

**`Parastina bexçeyan berpirsiyariya her kesî ye`**



Rêveberiya Mekteba Ekolojî a Şaredariya bajarê Qamişlo Nûşîn Ibrahîm derbarê mijarê de wiha got: “Em di tevahiya bexçeyên bajarê Qamişlo de kar dikin û wan dişopînin. Zêdeyî 30 Karkerî li gorî bernameyeke diyarkirî ji bo 30 bexçeyî hatine erkdarkirin. Di her bexçeyekî giştî de de no-



bedarek sibehê û nobedarek êvarê heye ku di warê avdanî û paqijiyê de çavdêriya bexçe dike. Her wiha parastina bexçeyan berpisiyaria tvahî welatiyan ne.”
Nûşîn destnîşan kir ku ew bi tevahiya karên pêwîst yên ji bo bexçeyan radibin û wiha got: “Me ji bo rakirina giyayên dirêj, beriya hefteyekê pêngavek destpêkir, her wiha ji bo pirsgirêkên û kêmaniyên ku di bexçeyan de derdikevin , wem çareser dikin.”

**` Di rojên pêş de em ê daristanekê çêbikin `**

Rêveberiya Mekteba Ekolojî a Şaredariya bajarê Qamişlo Nûşîn Ibrahîm daxwaz ji welatiyan ji bo parastina bexçeyan bi edrkê xwe rabin û axaftina xwe wiha qedand: “Wê şopandina me ya ji bexçeyan re rojan e be. Em hewl didin ku qada kesk zêde bikin. Di rojên pêş de, em ê daristanekê çêbikin û em hewl didin ku daran zêde bikin. Hêvîdar in ku welatî bi me re hevkariyê bikin. Ji her kesî tê xwestin bi erkê xwe rabe û bexçeyan biparêz e.”



# Çiya Kurd: Dozên hevbeş ên Rêveberiya Xweser û dewletên Ereban hene

**Navenda nûçeyan**

**Bedran Çiya Kurd destnîşan kir ku ew destekê didin hewldanên dewletên Ereban ên ji bo çareseriya Sûriyeyê û bal kişand ku di navbera rewşa Sûriyeyê û dewletên Ereban û di navbera Rêveberiya Xweser û dewletên Ereban de dozên hevbeş hene ku dikare bi hev re li ser kar bikin.**

Piştî zêdetirî 10 salan di 7`ê Gulanê de carek din endamtiya Sûriyeyê ya Komkara Erebî hat pejirandin. Hevserokê Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Bedran Çiya Kurd têkildarî mijarê axivî. Çiya Kurd got: “Vegera Sûriyeyê li hembêza erebî dikeve berjewendiya giştî ya Sûriyeyê û berjewendiya gelê Sûriyeyê. Lê şert e ku ev gav li pêş çareseriya siyasî ya



krîza Sûriyeyê ku ket sala xwe ya 13`yemîn, nebe asteng. Berovajî wê, divê xebat were kirin ku biryara vegera Sûriyeyê li Komkara Erebî bibe gaveke girîng ji bo pêşxistina proseya siyasî li Sûriyeyê û peydakirina çareseriya siyasî. Divê ev helwest esas bê girtin.”
Meclisa Komkara Erebî ya 7`ê Gulanê li ser asta wezîrên derve û bi serokatiya Misirê civînek awarte li dar xist, tê de biryara vegera Sûriyeyê li komkarê erê kir. Çiya Kurd, encamnameya civîna Komkara Erebî ku tê de bal kişand ser çareya siyasî ya li gorî biryara 2254`an, erênî nirxand û got: “Em destekê didin hemû hewldanên erebî yên dikevin xizmeta vê rêgehê.”

**Bidawîkirina dagirkeriyê ji bo çareseriyê pêwîstî ye**

Çiya Kurd anî ziman ku girîng e ku lihevkirineke erebî li ser nêrînên siyasî yên realîst pêk werin, ku çareyek bê dîtin, mafên hemû pêkhateyên Sûriyeyê bên misogerkirin, dagiekeriya dewleta Tirk li parçeyên berfireh ji Sûriyeyê bê redkirin û dawî lê were anîn û got: “Ev ji bo çareseriya giştî pêwîstî ye.”
Çiya Kurd diyar kir ku di navbera rewşa Sûriyeyê û dewletên Ereban û di navbera Rêveberiya Xweser û dewletên Ereban de dozên hevbeş hene ku dikare bi hev re li ser bê xebitandin û bên çareserkirin. Çiya Kurd anî ziman ku li gel Rêveberiya Xweser gelek hêmanên siyasî, aborî, ewlehî û mirovî ku ji bo çareseriya li Sûriyeyê girîng in hene, ji lew re dikare di pêvajoya pêş de roleke girîng bilîze û wiha pê de çû: “Ji ber ku çareya siyasî li Sûriyeyê ne tenê bi rêya Şamê dibe, divê hemû sûriyeyî beşdarê bin û ji bo wê gavên cidî û aktîv biavêjin. Me berê jî bi rêya beyannameya xwe ya çareseriyê jî ev yek gotibû.”

**‘Em nikarin encamên yekser ên vegera sûriyeyê li komkara erebî pêşbîn bikin`**

Bedran Çiya Kurd anî ziman ku ew nikarin encamên yekser ên vegera Sûriyeyê li Komkara Erebî pêşbîn bikin û wiha dom kir: “Ev encam girêdayî demê û derfeta hikumeta Sûriyeyê ya pêkanîna hin daxwazên di çarçoveya çareseriya siyasî de û hêza wê ya guhertinê ve girêdayî ye. Lê em geşbîn in ku hin dewletên Ereban karibin proseya siyasî bi pêş bixin.”
Çiya Kurd bi rêya ajansa me ev bang li hêzên aktîf û dewletên Ereban kir: “Divê hêzên aktîv û dewletên Ereban bi awayekî cidî bixebitin û tevî hêzên sûriyeyî bi hemû meylên wan û di serî de Rêveberiya Xweser re bikeve peywendiyê. Pirbûna peywendiyan û naskirina rewşa Sûriyeyê ji nêz ve ji aliyê dewletên Ereban ve, dê ji bo serkeftina hewldanên ereban ên çareseriyê û mayîndekirina ewlehiyê li seranserê herêmê de, rolek mezin bilîze.”

# ‘Wê faşîzma AKP-MHP’ê bi destê me hilweş e’

**Navenda nûçeyan**

**Endama Komîteya Rêveber a PKK’ê Hêlîn Umît diyar kir ku, ev hilbijartin wê ji bo her beşê civakê bibe destpêkek nû û got “10 sal in em şerê hilweşandina faşîzma AKP-MHP’ê dimeşînin. Eger wê îro hilweşe, ev yek wê bi destê kurdan û hêzên demokrasiyê, rêya sêyemîn wê faşîzmê hilweşîne.”**

Endama Komîteya Rêveber a PKK’ê Hêlîn Umît qala şerê gerîla yê li dijî dagirkeriyê û bandora tevgera azadiyê ya li ser hilbijartinên li Tirkiyeyê û bakûrê Kurdistanê kir.

**‘Rêber Apo tu carî nekete xefika wan’**

Endama Komîteya Rêveber a PKK’ê Hêlîn Umît destpêkê berxwedana Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan silav kir û hezkirin û hesreta xwe careke din pêşkeş kir.
Hêlîn Umît got, “Ji bo hilbijartinê hefteyek maye. Bêgûman pozîsyona Rêber Apo ne tenê eleqeya xwe bi hilbijartinê re heye. Ji roja avakirina sîstema qirkirinê ya Îmraliyê û vir ve di nava 25 salan de êrîşên cihêreng li hemberî gelê kurd hatin kirin. Bi nêzîkatiyeke mîna amûrê nêzî Îmraliyê bû, nêzî Rêber Apo bûn. Di demeke nêz de jî; beriya salekê, beriya du salan, di hilbijartinên beriya niha de hêzên desthilatdariyê, bi taybetî jî AKP-MHP’ê li dijî hêzên azadiyê yên gelê kurd hewl dan ku Rêber Apo bi kar bînin. Lê belê rastiya Rêber Apo, saziya rêbertî li vê yekê girtî ye. Ti carî nekete xefika wan.”

**‘Bi saya berxwedana Gerîla îro faşîzm hatiye ber têkçûnê’**

Di dewama axaftina xwe de Hêlîn Umît bal kişand ser şerê gerîla yê li



dijî dagirkeriyê û got, “Gerîlayên me yên HPG û YJA Starê mohra xwe li vê salê xistin. Eger niha qala hilbijartinê tê kirin, eger hilbijartin di atmosfereke ‘demokratîk’ de dikare bê nîqaşkirin, ya jî eger qala hêviyek ji bo têkbirina desthilatdariyê ya di hilbijartinê de tê kirin, garantora vê yekê têkoşîna me ye. Eger bi rastî jî li Zap, Avaşîn, Metîna, Heftanînê pêşî li dagirkeran nehatibûya girtin, dibe ku îsal hilbijartin nehatibûya kirin, wê tiştekî din hatibûya îlankirin.”
Hêlîn Umît got, “Rast e me gelek berdêl dan, gelek hevalên me şehîd bûn. Ji ber ku şerekî gelekî giran e. Lê belê sekna fedaî ya li hemberî vî şerî, kir ku di konjonktura heyî de AKP-MHP bigihêje ber têkçûnê.”

**‘Banga min ji herkesî re ew e ku biçin ser sindoqan’**

Ez di wê baweriyê de me ku sibeha 15’ê Gulanê wê ji bo Tirkiye û Kurdistanê nûbûnekê bi xwe re bîne. Wê faşîzma AKP-MHP hilweşe. Wê li Tirkiyeyê têkoşîna demokrasiyê bikeve serdemeke nû. Têkoşîn wê neqede. Em bi vî rengî nêzîk dibin. Em ê bikevin nava demeke nû, bikevin pêvajoyeke nû ya têkoşînê. Li ser vê bingehê ez bang li jinan, ciwanan, tevahiya gelê kurd, hêzên demokrasiyê yên li Tirkiyeyê, gelên Tirkiyeyê, cihêrengî, dewlemendî, nasnameyên li Tirkiyeyê, Elewiyan dikim ku li ser vê bingehê tevlî bibin. Serkeftinê dixwazim.”

# Konseya Ewropayê: Divê dewleta Tirk dawî li helwesta dijminane bîne

**Navenda nûçeyan**

**Konseya Ewropayê bal kişand ser binpêkirinên mafên mirovan ên di pêvajoya hilbijartinên Tirkiyeyê de û diyar kir ku dewleta Tirk “dijminane” tev digere û jê xwest ku dawî li vê nêzîkatiya xwe bîne.**

Komîseriya Mafên Mirovan a Konseya Ewropayê, têkildarî operasyonên girtinê yên li Amed û Enqereyê ku gelek siyasetmedarên Kurd, hunermend, hiqûqnas û rojnameger hatibûn destgîrkirin û girtin, daxuyanî da.
Di daxuyaniyê de komîseriyê bertek nîşanî Tirkiyeyê da û wiha got: “Tirkiye bi nêzikatiyeke dijminane nêzî parastvanên mafên mirovan, rojnameger û parêzeran dibe û divê dev ji vê nêzikatiya xwe berde. Hewl dide bi kiryarên îdarî û edlî bêdeng bike û divê dev ji vê sepana xwe berde. Di pêvajoya hilbijartinê de zexta xwe ya li ser aktorên herî girîng ên civaka demokratîk zêde kirine. Bi vê yekê re rewşa mafên mirovan, azadiya xweîfadekirin, xwe birêxistin kirin û civînan hêj xerabtir bûye.”

**‘Rê li ber fikaran vedike’**

Di daxuyaniyê de Komseriya Mafên Mirovan bal kişand ser girtin û destgîrkirinan û wiha got: “Zêdetirî 120 kes bi hinceta endamtiya rêxistinê hatin destgîrkirin û bi awayekî komî bi ser malên wan de hatiye girtin. Ev yek rê li ber fikarên mezin vedike. Li gorî îdiayên heta niha temînata ewlehiyê hatiye binpêkirin û



polîsan tundî kiriye. Tê ragihandin ku lîsteya rojnamegerên girtî ya Tirkiyeyê hêj dirêjtir bûye. Tevî biryara binpêkirinê ya Dadgeha Destûra Bingehîn a ji bo Dayikên Şemiyê/Xizmên Windakiriyan jî, rayedaran mafê azadiya civiyanê neparastin. Ji ber ku ev mafê xwe bi kar anîne, li dijî wan teqîbatên cezayî hatin destpêkirin. Ev yek jî yek ji mînakên din ên xetereyên li ser mafên mirovan e.”
Komîseriyê bi bîr xist ku platformên medyaya dijîtal tên astengkirin, li dijî rojnameger û dezgehên çapemeniyê her tim doz tên vekirin û ev tişt hatin gotin: “Her wiha RTUK ji ber nûçeyên rexneyî cezayên pereyan ên giran dide. Astengiyên din ên li pêşiya xwegihandina agahiyê, di heman demê de bandoreke neyînî li ser rojnameger û dengên rexnegir jî çêkiriye. Asamblesa Parlamenteran di meha nîsanê de çûbû serdana Tirkiyeyê. Weke ku wan jî piştre eşkere kiribûn, bandoreke pir giran li ser agahiyên piranîparêz û nîqaşên cemaweriyê yên vekirî kiriye.”

**‘Berpirsyariyên mafên mirovan pêk bîne’**

Bi domdarî hate gotin ku xebatkarên cemaweriyê yên payebilind jî di nav de, gotinên nefretê yên li dijî kêmneteweyan û LGBTÎ+’yan zêde bûne û daxuyanî wiha bi dawî bû: “Ev yek rê li ber fikarên mezin vedike. Ev gotinên nefretê yên li dijî van koman tên kirin, di rewşeke ku tundî û sûc zêde dibin de, rageşiya di nava civakê de zêdetir kir. Banga me ji bo meqamên tirk ew e ku dawî li zextên ser parastvanên mafên mirovan, rojnameger, rêxistinên civaka sivîl û parêzeran bîne û di demekê pêvajoya hilbijartinê de bikin ku pirdengî pêş bikeve û berpirsyartiyên xwe yên têkildarî mafên mirovan pêk bîne. Banga me ji bo hemû aktorên cemaweriyê û siyasî ew e ku xwe ji gotinên nefretê yên ziyanê digihînin mafên mirovan û rê li ber nefretê vedikin dûr bikin.”

# “Insiyatîfa Rêveberiya Xweser Bingeha Çareseriyê Ye”

Zana Roj /Qamişlo

**Gulîstan Elî diyar kir ku Insiyatîfa Rêveberiya Xweser a ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê bingeh û riya yekane a çareseriyê ye. Herwiha da xuyakirin ku ew ji bo pêşwazîkirina penaberan amade ne û wan ji bo wê bang li Netewên Yekbûyî kiriye ku bibin alîkar.**

Kirîza Sûriyê 12 sal li pey xwe hişt, di şerê Sûriyê de bi 100 hezaran mirov hatin kuştin û bi milyonan mirov jî, ji ber rewşa şer berê xwe dan welatên derdorê û wekî penaberan li wan welatan dimînin. Hêzên navnetewî û herêmî her dem hewil didin ku pirsgirêka penaberên Sûriyê ji bo berjewendiyên xwe bikar bînin. Bi taybetî dewleta Tirk a dagirker ku kaxeza penaberên Sûrî ji bo pêkanîna siyaseta xwe ya qirêj dixe dewrê. Tevî ku bi 10’an civîn û hevdîtinên ji bo çareserkirina Kirîza Sûriyê hatin e li darxistin, lê her dem ev cîvîn bê encam man, ji ber ku hêzên di van civînan de beşdar dibûn temsîla gelê Sûriyê nakin, her wiha gelê Sûriyê derveyî van civînan dimîn e.

Di demekê de ye ku kirîza Sûriyê roj bi roj gurtir dibe, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di 18`ê Nîsana borî de beyannameyek ji bo çareserkirina aloziya Sûriyeyê pêşkêş kir. Beyannameya ku ji 9 xalan pêk tê, teqeziyê li ser misogerkirina mafên tevahî pêkhateyên Sûriyeyê dike, her wiha teqeziyê li ser yekîtiya xaka Sûriyeyê, bidawîkirina dagirkeriya Tirk û domandina têkoşîna li dijî terorê dike. Her wiha li gorî wê, berhemên Sûriyeyê milkê tevahî gel in ku divê bi awayekî adilane werin parvekirin.



Di heman çarçoveyê de, ji ber rewşa xerab ya penaberên Sûrî ku li Lubnanê dimînin, herwiha hejmareke dewlet hewl didin ku têkiliyên bi hikumeta Şamê re normalîze bike û hinek hêzên Lubnanê hewl didin mijara penaberên Sûriyeyê bilivînin, Rêveberiya Xweser ragihand ku ew amade ne penaberên sûrî yên li Lubnanê pêşwazî bikin û bang li NY`yê kir ku ji bo vegera penaberan, korîdorek mirovî di navbera herêmên Rêveberiya Xweser û Lubnanê de veke.

Di derbarê insiyatîva Rêveberiya Xweser û xala pêşwazîkirina penaberên derveyî welat endama Desteya Rêveber a Karên Derve ya Rêveberiya Xweser Gulistan Elî ji rojnameya me re axivî.

Gulistan bal kişand ser girîngiya însiyatîva Rêveberiya Xweser û wiha got: “Di pêvajoya rewşa Sûriyê ya dawî de, her ku diçe kirîza Sûriyê kurtir dibe. Tavahî pirsgirêkên ku hatine jiyankirin û altirnatîfên çareserkirinê gihîştine asta xetimandinê, êdî ne hikumeta Şamê dest ji kursiya xwe berdide û ne jî baweriya gel bi çaresariya wê ma ye. Li ser wî esasî di pêvajoyeke wiha hesas û girîng de, Rêveberiya Xweser gavavêtineke mezin ya ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê avêt û însiyatîva ku ji 9 bendan pêk tê di 18 ê Nîsanê d eşkerekir.”

**`Rêveberiya Xweser ji bo tavahî gelên Sûriyê çareseriyê pêşkêş dike`**

Gulistan diyar kir ku Rêveberiya Xweser di însiyatîfê de helwest û cidîbûyîna xwe ya ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê da xuyakirin û wiha domand: “Di pêvajoya kirîza Sûriyê de Rêveberiya Xweser ji destpêka demazrandina wê ve, her tim lêgerîna çareseriya aloziyên ku tê jiyankirin, kiriye. Dewlet û hêzên navneteweyî heyanî niha jî neketina ferqa ku Rêveberiya Xweser ji bo tavahî xaka Sûriyê difikire, lewra Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev îsiyatîf ji bo tavahî dewletên herêmî û yên cîhanî pêşkêş kir ku ji bo çareseriya pêvajoyê tavahî cîhan bikeve cidîbûyîna sekna Rêveberiyê.”

**Rêveberiya Xweser banga pêşwazîkirina penaberên Lubnanê kir**

Gulistan anî ziman ku tavahî bendên ku di însiyatîvê de hatine eşkerekirin wê ne tenê tewrî bimînin, bi taybet xala pêşwazîkirina penaberan yên Lubnanê û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Rêveberiya Xweser di xuyakirina bendên însiyatîfê de gelek hesas û bi cidî nêz bûye, bi eşkerekirina van bendan dide diyar kirin ku ev xal wê tenê tewrîk li ser kaxizan nemînin, tavahî hewildan wê ji bo piratîkkirina wan wê bê kirin. Bi taybet gava yekemîn a ku hatiye avêtin, ew jî pêşwazîkirina penaberên Sûriyê yên ku li Lubnanê jiyan dikin e. Dewleta Lubnanê di van demên dawiyê de di nava kirîzên aborî yên cidî re derbas dibe. Di heman demê de ji ber hejmareke mezin ji gelê Sûriyê berê xwe da Lubnanê Rêveberiya Xweser xwe li hember rewşa wan berpirsiyar dibîne, lewra jî banga pêşwazîkirina tavahî gelê Sûriyê yên ku dixwazin vegerin, kir.”

**Bang li Neteweyên Yekbûyî hat kirin**

Gulistan da xuyakirin ku Rêveberiya Xweser banga netewên yekbûyî kir ku bibin alîkar ji bo vekirina korîdorên derbaskirina benaberan û wiha got: “Ji bo pêşwazîkirina paneberên Sûriyê yên derve, ji erka Neteweyên Yekbûyî ye ku bibe alîkar. Ji bo wê Rêveberiya Xweser banga Neteweyên Yekbûyî kir ku bibe alîkar ji bo rêxistinkirina altirnatîveke hevbeş ya vekirina korîdorekî fermî di navbera me û Lubnanê de.”

**`Hikumeta Şamê rê li çareseriyê venake`**

Endama Desteya Rêveber a Karên Derve a Rêveberiya Xweser Gulistan Elî eşkerekir ku Hikumeta Şamê tevî 12 sal ji talankirinê û hîn jî ji diyalogên çareseriyê re ne hazir e û wiha qedand: “12 sal li ser xaka Sûriyê tavahî cureyên tundî, qetilkirin, talankirin û hilweşandinê hat jiyankirin, lê belê Hikumeta Şamê heyanî vê kêliyê jî ji bo parastina berjewendiyên xwe rê li pêşiya çareseriyê venake. Di heman demê de xaka Sûriyê di bin destên hêzên gerantor de hêştiye. Em jî vê yekê dibêjin heyanî ku ev hêz ji Sûriyê dernekevin û diyalogên çareseriyê pêş nekevin wê bidawîkirina van kirîzan ne gengez be.”

## YEKÎTIYA EREBAN DIKARE REWŞA SÛRIYÊ BIGUHERE



DILYAR CIZÎRÎ

Di roja 7’ê gulanê de Meclîsa Giştî ya Yekîtiya Ereban li ser asta wezîran bi rêveberiya Misrê li Qahîrayê civiya û biryara da hikûmeta Şamê ku ev 12 sal in ji nava xwe derxistibûn, vegere. Balkêşe ev biryar piştî mijara lihevhatina di navbera hikûmeta Şamê û Tirkiyayê ket rojevê û piştî hevdîtinên 4 alî yên di navbera Rûsiya, Tirkiyê, Îran û hikûmeta Şamê de ketibûn rojevê. Welatên ereban bi vê yekê hewl didin di guhertina rewşa li Sûriyê de xwedî insyatîf û rol bin. Ew wiha texmîn dikin wê bi vegera Sûriyê ya nava Yekîtiya wan karibin rola Îranê di Sûriyê de qelis bikin. Heger mirov destwerdana Îran di Sûriyê de di astên leşkerî, siyasî, civakî û her wekî din bibîne, mirov dibêje, wê Yekîtiya Ereban bi van gavan nikaribe bandor bike. Mane Rûsiya û Tirkiyê jî destpêkê bêyî Îranê hevdîtinên sê alî bi nûnerên Hikûmeta Şamê re lidarxistin, lê dema dîtin bêyî Îranê nikarin bandorê li rêveberiya Hikûmeta Şamê bikin, Îran jî kirin beşekî civînan. Lê ji ber civînên wan di çarçoveya berdewama 18 civînên Astanayê de pêk hat û tu berjewendiyên gelê Sûriyê tê de tune ye, tu encam bi xwe re ne anî.
Niha jî heger Yekîtiya Ereban bixwazin bi rastî di çareseriya demokratîk a li Sûriyê de bibe xwedî rol, pêwîste di serî de bi nûnerên rasteqîn ên gelê Sûriyayê re bicivin. Insyatîfa Rêveberiya Xweser a ji bo çareseriya aloziya Sûriyê zemîneke baş ava dike. Di vê derbarê de heger sûd ji ezmûna 12 salan a hevdîtin û civînên li Cinêv, Sotçî, Astana û Qahîra were girtin, wê gavên erênî li ser xeta çareseriyê bêne avêtin. Hemû civînên behsa mijarê ji ber destwerdanên dewletên herêmî û navdewletî bê encam derbas bûn.

Halê hazir û piştî Sûriyê careke din kursiya xwe ya Yekîtiya Ereban bi dest xistiye jî lê hîn tiştekî diyarker û zelal nîne. Gelek şîroveyên cûda têne kirin. Meclîsa Sûriya Demokratîk (MSD) jî mijar wekî gavekî erênî nirxand û destnîşan kir wê di aliyên herêmî û navdewletî de jî bandorê li ser dosya Sûriyê hebe.
Erê raste lê heger Yekîtiya Ereban karibe hemû aliyên Sûriyê beşdarî maseyên danûsitandinê bikin, wê zemîna riyên çareseriya demokratîk a li gorî biryara Konseya Ewlekariyê ya NY’yî 2254 were amedekirin. Ji xwe jî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê zemînekî wê ya zindî ye. Li jor jî me got hemû civînên navdewletî yên bêyî beşdarbûna nûnerên Rêveberiya Xweser vala diçûn. Çerxa Sûriyê jî piştî her civînekî berûvajî digeriya, li şûna çareseriyê dagikerî, şer, kuştin, wêranî, talan û her wekî din li ser xaka Sûriyê derket asta hîn jordetir. Em îro jî dibînin di encamê de beşek mezin ji xaka Sûriyayê veguherî navenda çêkirin û belavkirina madeyên hişbir. Ev jî xeteriyê li ser tevahî welatên herêmê çêdike. Li beşekî din komên tundrew têne amadekirin. Ew jî metirsiyê li ser tevahî cîhanê çêdikin. Lê cardin jî hêviya me vê carê heye bi rastî gav di xeta çareseriya aloziyê de bêne avêtin.

## Ji bona paşerojeke azad dengê xwe bidin xwe



Elî Roj

Di demeke ku gelek hevsengî û aliyên heremî û nevnetewî li pey berjewendiyên xwe ne û her yekî li gorî çiqarên xwe tevdigere. Li Tirkiyê demeke dîrokî tê jiyankirin û hilbijartinên 14’ê Gulanê li ber derî ne, kampaniya hilbijartinan jî di vê çarçoveyê de tê meşandin. Li aliyekî din jî gelek hene ku hêviyên xwe bi serkeftina AKP’ê ve girêdidin û ji xwe re dibêjin dema ku AKP’ê bi ser bikeve wê rewşa wan baştir bibe. Girêdayî vê yekê û bi taybet jî penaberên Sûriyê yên ku Erdogan di destpêka şoreşa Sûriyê ve li ser wan bazarî û siyasetê dide meşandin û di hilbijartinên 14’ê Gulanê de jî dixwaze wan bikarbîne. Ruxmî tişta ku Erdogan bi serê penaberên Sûrî kirî, lê hîn jî baweriya xwe bi AKP’ê û Erdogan tînin û hêviyên xwe pêve girêdidin.
Gelek kiryarên di derheqê penaberên Sûrî yên ku li Tirkiyê jiyan dikin têne meşandin, didin isbat kirin ku rojane tûndî û şidet li ser penaberên Sûrî bi hişmendiya sîstema faşîs, qirker û kujer tê meşandin. Di dema erdhejê de welatiyên Sûrî bi darê zorê ji cihê wan hatin derxistin û di şûna wan de tirk hatin bi cih kirin. Gelek ciwanên Sûrî bi destê nijatperestên Tirk hatin kuştin û li hemberî wan şidet, girtin û li wan hate xistin. Her weha bi darê zorê welatiyên Sûrî ji Tirkiyê hatin derxistin. Ev bûyer û gelek rûdawên ku heyanî roja îro di derheqê Sûriyên penaber de têne meşandin, hîn şûna wan di bîr û hizrê hemû Sûriyên penaber de, zindî ye. Xizanî, bêkarî û rewşa abûrî û daketina lêreya Sûrî li beramberî dolar, ev yek jî encama siyaseta AKP’ê û MHP’ê ye. Ji ber vê yekê pêwîste ku li Tirkiyê tevahî gel û kesayetên azadîxwaz û demuqrat dengê xwe nedin AKP’ê û MHP’ê. Ji ber ku her dengekî ku ji bona AKPê û MHPê ye, ew deng ji bona şer, komkujî, wêran û qirkirina gelan e. Dendê ji bona AKPê û MHPê wê hîn zêde bibe sedemê kûrkirina alûziya tirkiyê, sûriyê û rojhilata navîn. AKPê û MHPê dixwazin bi êrîşên ser qadên berxwedanê û bakur û rojhilatê sûriyê û bi hemû rengên çekên qedexekirî, encam bigre û bandorê li qampaniya hilbijartinan û encama wê bike. Ji bona ku AKPê û MHPê di hilbijartinên 14’ê Gulanê de bi ser bikevin, wê her tiştê ku nakeve hişê mirovan bikin. Ji ber ku AKPê û MHPê hilbijartinên 14’ê Gulanê ji bona xwe mîna man û nemana xwe dibînin û ji neha ve serî li dek û dolaban dixin û kelek sixtekariyê û hîleyan dikin. Di serî de pêwîste gelê kurd û hemû kes, partî, azadîxwaz û demuqrat, bi rengekî baş rastiya AKPê û MHPê nasbikin û rûyê wan ê gemar û qirêj di hilbijartinên 14’Gulanê de ji bona cîhanê eşkere bikin. Ji ber ku erdogan mîna şevşevoka ku roj dema derdikeve û nizane xwe li kudê veşêre. Erdoxan jî ji ber ku ji neha ve dizane ku wê di hilbijartinan de binbikeve, ji ber vê yekê ji neha ve dest bi sixtekarî û hîleyan kiriye û dixwaze bi vê yekê bandoreke neyînî li ser hilbijartinên 14’Gulanê bike.

Kesên ku naxwazin êdî binçavkirin, kuştin, komkujî, wêran, koçberî, betalî, bêkariyê û paşerojeke tarî mîna dojeha ku her tiştî tar û mar dike bibînin. Bile ji neha ve aqilê xwe bînin serê xwe û bi soz û gotinên Erdogan neyên xapandin. Ji ber ku ji bilî hovîtî, qirkirin, kuştin, koçberî û kiryarên dij mirovî, tiştekî ku Erdogan bide vî gelî nema ye. Partiya çepên kes û eniya ked û azadiyê roj û şev, gund bi gund, kolan bi kolan û bajar bi bajar ji bona serkeftina dengê azadî û demuqrasiyê kar û xebatê dike û gel hêviyên xwe di vê partiyê û vê eniyê de dibîne. Ji neha ve tê xuyakirin ku gelê me yê welatperwer ji heft salî heyanî heftî salî wê dengê xwe bide Pariya Çepên Kesk. Ji bona azadiya fêzîkî ya Rêber APOye û çareseriya pirsgirêka kurd û azaiya civakê ye pêwîste ku em dengê xwe bidin xwe. Ji bona rastî di tariyê de nemînin û ji bona ku dengê heqîqetê her bilind were bihîstin, pêwîste ku em şev û roj û bê rawestandin di nava tekoşînêdebin. Roj roja azadî û serkeftina gelan e. Ji bona ku em dawiya qirkirin, pişaftin û dagirkeriyê bînin em dengê xwe bidin Partiya Çepên Kesk.



# Kompilo Û Tecrîd Nikarin Felsefeya Rêber Ocalan Ji Holê Rakin

Girêdayî bêdengiya navnetewî di derheqê tecrîda ku li ser Rêber Ocalan tê meşandin. Berdevka Kongira Star û endamê saziya meclîsa Şehîdan a kantona Qamişlo anî ziman ku, di şexsê Rêber Ocalan de dixwazin îradeya gel bişkînin û gotin “Rêber Ocalan felsefeya jiyana me avakir, wê ev gel heyanî serkeftinê di vê felsefê de bi îsrar be.”

Zana Roj /Qamişlo

Tecrîda li îmraliyê di şexsê Rêber Ocalan de tê meşandin pêwîste ku were mehkûm kirin, dewletên navnetewê jî, li hembr sûcên ku di girtîgeha Îmraliyê de dibin ker, kor û lal in. Zêdetirî 2 salane ku tu agahî li ser Rêberê gelê azadîxweaz Abdullah Ocalan nayên girtin. Rêber Ocalan 24 Salin di girava Îmraliyê de di bin tecrîdeke girankirî de jiyan dike, her çiqasî xwestine felsefe û bîrdoziya Rêbertî di nava çar dîwaran de sînordar bikin, lê belê bîrdoziya demokrasiyê ya sedsala 21 emîn derbasî jiyana tavahî cîhanê bû.
Têkildarî tecrîda Fîzîkî ya li ser Rêber Abdulah Ocalan hatiye ferzkirin berdevka Kongira Star Şaha Xelîl û endamê Saziya Malbatên Şehîdan Kêfo Osman yên Kantona Qamişlo ji rojnameya me re axivîn.

**`Tecrîd berdewamiya kompiloyê ye`**

Şaha xelîl di destpêka axaftina xwe de tecrîda li ser Rêbertî bi tundî şermezar kir, her wiha destnîşan kir ku tecrîda heyî bi riya kompilogeran tê birêvebirin û wiha pêde çû: “Tecrîda ku li ser Rêber Ocalan tê meşandin ji kompiloya navnetewî ne cuda ye. Çawa ku di kompiloya navnetewî de nikarîn felsefeya Jiyana Azad sînordar bikin û ev felsefe kete meriyetê. Ji bo hêzên kompiloger jî ev yek bû têkbirina armancên wan, lewra bi riya girankirina tecrîdê dixwazin gel ji Rêbertî qut bikin û careke din pilanên xwe mayînde bikin.”

**`Riya têkbirina desthilatdariyê felsefeya Rêber Ocalan e`**



Şaha anî ziman ku kompilo li dijî felsefeya Rêber Ocalan ne û wiha got: “Felsefeya Rpber Ocalan ji bo azadiya gelan û cîhanê xwediyê giringiyeke taybet e, û felsefeya Rêber APO, ne tenê ji bo doza azadiya Kurdistane ye. Ji bona vê yekê sîstema qaptalîs bîrdoziya Rêber Ocalan ji bona demokrasî û azadiyê li ser hebûn û serweriya xwe xeteriya herî mezin dibîne. Bi riya tecrîdê dagirkeriya Tirkiyê û hêzên navnetewî dixwazin felsefeya Rêber APO asteng bikin û nehêlin berbelavî tevahî cîhanê bibe.

**`Li hember dagirkeriyê û hişmendiya netewdewletê tekoşînê bilind bikin`**

Her wiha Kêfo bilêv kir ku Rêber Ocalan ne dîlgirtiyekî ji rêzê ye, ji bo sînordarkirina ramanê Rêber APO tevahî zagonên mirovî têne binpê kirin û wiha got: “Tecrîda ku li ser Rêber Abdulah Ocalan ji 24 salan ve tê meşandin. Ev tecrîd dîrokeke xwe ya dirêj heye ku tavahî pîvanên mirovahiyê derbas kirî ye. Di îmraliyê de ji bo sînorkirina ramanên Rêbertî nahêlin ku pirtûk, Rojname û kovar derbasî girtîgehê bibin. Lê rûxmî tavahî astengiyan jî Rêber Ocalan bi sedan pirtûk nivîsandin û têkoşîna herî giran li hember dagirkeriyê û hişmendiya netewdewlet dide meşandin.






**`CPT hevkarê sûcê tecrîdê ye`**

Endamê saziya malbatên Şehîdan Kêfo Osman ragihand ku CPT li hemberî Îmraliyê Sûcdar e, her wiha tekez kir ku bi dîlgirtina Rêber APO wê nikaribin fikir û felsefeya wî asteng bikin: “CPT bi nêzîkatiyên xwe yên derbarê tecrîda li ser Rêber Ocalan dibe hevkarê pergala tecrîdê. Ji rêxistinên navneteweyî ya mafê mirovan tê xwestin ku li hemberî tecrîdê xwe bêdeng nekin, her wiha bi erkên xwe yên exlaqî rabin. Di heman demê de ji tavahî gelên azadîxwaz tê xwestin ku li hemberî tecrîdê têkoşîn bikin û Rêberê mirovahiyê azad bikin. Bila dewleta Tirk û hevkarên wê zanibin ku tu kes wê nikaribe rê li pêş belavbûna felsefey Rêber Ocalan bigire û destkeftiyên gelê Kurd têk bibe.

## Lêgerîna Çareseriya ku xwe dispêre qirkirina Kurdan



Zekî Bedran

Ji hilbijartina Tirkiyê re kêm ma. Ragihandina Ewropa û DYE yê hilbijartin weke bûyera îsal a herî girîng binav dikin. Min di nivîsên xwe yên beriya niha jî diyar kir ku ev hilbijartin pir girîng in. Qasî ku ji Tirkiyê re girîng e, di heman demê de ji Rojhilata Navîn re jî girîng e. Ji ber ku eger faşîzma Erdogan bi ser bikeve, dê polîtîkayên xwe yên belavbûn û dagirkeriyê bidomîne. Yê ku herî zêde ji vê bandor bibe jî Rojhilata Navîn e. Hewldanên êriş û dagirkeriyê li Iraq û Sûriyê li holê ye. Tirkiyê herî zêde zirarê dide cîranên xwe. Lê qada tevgera wê ne tenê welatên cîran in. Heta Lîbya, welatên Korfez û Efrîqayê destwerdan kir, xwest bi bandor bibe. Ji derveyî wê bi hêzên çekdar ên li dora xwe komkirî gefan li cîhanê dixwe. Bûye welatekî ku terorê derbasî cîhanê dike. Li hemberî Ewropa, DYE û NATO’yê qerta xwe ya Rûsyayê bikar tîne. DAIŞ, El- Nûsra û bi dehhezaran çeteyên ku berhevkirî li herêmên dagirkirî xwedî dike, perwerde dike û diparêz e. Xwest bi van hêzan rejîma Sûriyê biguhere. Piştî ku nekarî rêveberiya Esad hilweşîne, niha jî dixwaze bi hikumeta Şamê re hevdîtinan pêk bîne û van çeteyan bike hevkarê rêveberiyê.
Erdogan li qadên hilbijartinê heta dawî dijminahiya Kurdan bikar tîne. Zirara ku daye Kurdan weke serkeftin vedibêje. Dibêje, “me li Sûriyê di sê cihan re korîdora Kurdan şikand, dagir kir û planên wan têk birin. Piştî hilbijartinan jî em ê herêmên mayîn bidest bixin. Em li benda demek guncaw û derfetekê ne”. Kurdên ku qalê dike ne li cihek nayên zanîn an jî ne li fezayê ne. Li Sûriyê li ser qadên xwe yên jiyanê ne. Hevpeymanên navdewletî binpê dike, axa Sûriyê dagir dike, destwerdana karê hindir dike û planên xwe ferz dike.
Rûsya, DYE û Ewropa qasî dihat xwestin li hemberî vê dagirkeriyê nesekinîn. Van dewletan berjewendiyên xwe esas girtin. Bi awayek vekirî-veşartî bi Tirkiyê re bazarî kirin, qetilkirin û koçberkirina Kurdan erê kirin. Ev bi salane DYE li Sûriyê ye. Bi QSD’ê re li dijî DAIŞ’ê tifaq çêkirin. Li herêmên ku qada hewayî di bin venêrîna DYE yê de ye, Tirkiye hertim mirovan dikuje. Rûsya jî bi heman şêweyî weke temaşevan lê dinêre. DYE di daxuyaniyên ku dide de dibêje “Têkiliya me ya bi QSD’ê re bi DAIŞ’ê re sînordar e, leşkerî ye û teqtîkî ye”. Ji ber DYE yê gelek hêz bûn dijminên Kurdan. Lê DYE xwedî li rêveberiya xweser derneket. Tu piştgirî neda. Ji ber vê sedemê Tirkiye evqas bêpewre bû. QSDê û rêveberiya xweser beşdarî tu hevdîtinên navnetewî nekirin û li her cihî hat vederkirin. Hem Rûsyayê, hem jî DYE û Ewropayê hertim ev yek bi helwesta Tirkiyê ragihandin. Jixwe faşîzma Tirk Kurdan û rêveberiya xweser weke dijmin dibîne, naxwaze Kurd bên naskirin, dixwaze bên tunekirin. Lê eger hêzên mezin helwest nîşan bidin, hêza Tirkiyê nîne ku meydanê ji cîhanê re bixwîne.
Di rastiyê de eger DYE û NATO’yê piştgiriya Tirkiyê nekiribûna, niha ji mêj ve dewleta Tirk çareseriyek pejirandibûya. Dewleteke ku çavkanî û hêza wê sînordar e. Faşîzma Erdogan û Baxçelî tevahî çavkanî, danehevên hindir û derve heta dawiyê bikar anîn. Di rewşa niha de aboriya wî têk çûye, rûmeta wî ya derve tune bûye. Eger Erdogan dibêje ez ê êriş bikin û tarûmar bikin, dîsa hêz û cesareta xwe ji van dewletan digire.

Wezîrê Karê Derve Mevlût Çawûşoglu jî di daxwiyaniya xwe de got “Pirsgirêka Sûriyê bi rêbazên leşkerî nayê çareserkirin”. Pir balkêş e, Erdogan gefa êrişan dike, Çawûşoglu jî dibêje pirsgirêk bi rêbazên leşkerî nayên çareserkirin. Qasî tê fêmkirin, Çawûşoglu Kurdan û rêveberiya xweser ji Sûriyê nahesibîne. Yê ku qalê dike DAIŞ, El- Nûsra û hêzên bi çek kirine. Dixwaze wan bi Şamê re bike mijara bazariyê, Kurdan veder bike û daqurtîne. Di hişmendî û polîtîkayên wan de hevdîtin û lihevkirina bi Kurdan re tune ye. Sedema israra wan a ji bo hevdîtina bi Şamê re jî, tenê ji bo kuştina Kurdan û tunekirina Kurdan e. Li gel komkujî û dagirkeriyê negihiştin armanca ku dixwestin. Herêm bi tevger e, ditirsin ku hevsengî werin guhertin û Kurd li ser piyan bimînin. Ji ber wê dibêjin Şamê were em bibin yek, li hev bikin û Kurdan ji holê rakin.
Tirkiyê xwest bi hevdîtinên Astanayê re Kurdan tenê bihêle û herêmên xweser têk bibe. Hevdîtinên Astanayê ji derveyî vê nebûn dermanê tu derdan. Niha jî li Sûriyê derfeta çêkirina aştiya hindirîn û pêçana birînan heye, lê Tirkiye dixwaze vê derfetê ji holê rabike, pevçûnê di navbera Şam û Kurdan de çêbike û derî ji şerekî nû yê navxweyî re veke. Eger Erdogan hilbijartinê qezenc bike, dê polîtîkayên xwe dispêrin tarîtî û qirkirinê hîn bi biryardarîtir bidomîne. Herkesê ku aşitî û yekîtiya Sûriyê diparêze, pêwîste li dijî van planan hişyar bin.

## Dawiya Kartela Erdogan



Farûk Sakik

Tirkiye di dema Erdogan de wisa hat guhertin ne mimkûn e ku behsa dewletekê were kirin. Ji ber vê yekê rejima li Tirkiyê teqez dişibe kartelek. Kartel bi giranî peyvek ji bo baronên narkotîkê tê bikaranîn. Piştî demek bi vî pereyê ku ji narkotîkê bi dest xistine li her qadên bazirganiyê belav dibin. Li jorê kartelê navek heye û yên din jî li dora wî kom dibin.
Ev kartel pêwîstî bi pêkhateyên xwe heye. Pêkhateyên vê kartelê MHP, neteweperest, Suleyman Soylu, Ergenekon Mehmet Agar e. Ev aliyên siyasî ne. Hin kes jî bi şîrket û holdîngê xwe tevlî vê kartelê dibin.
Ev kartel kevneşopiya Susurlukê ye. Wê demê kartela Agar li desthilatê bû. Li dijî kurdan û hêzên demokrat ev kartel hatibû avakirin. Bi demê re ev hatibû tasfiyekirin. Îroj dişibe wê pêvajoyê. Ji ber vê yekê jî Erdogan gelekî bi hêz e û di heman demê de gelekî qels e jî. Carcarna kontrol ji dest wî derdikeve.
Taybetmendiyek van kartelan dema têkçûna wan nêzdibe, serî li her cure kaosê didin. Hiqûq, qanûn, nirxên mirovahiyê namîne.
Mînak, Kartela Sînaloa. Piştî rêberê Kartela Sînaloa, bi nasnav “El Chapo”, di operasyonekê de hate girtin, kolan tevlihev bûn. Li gelek bajarên eyaleta Sinaloa bûyêr qewimîn û komkujî pêk hatin.
Îroj herkes bi guman nêzîk dibe dibêjin, divê ku Kartela Erdogan jî piştî ku di hilbijartinan de têk biçe, wê teroreke bi vî rengî li seranserê Tirkiyê belav bike? Em ne bawer in. Kartela Erdogan bi hêza xwe ya sala 2015’an de nîne.
Çi bûbû? Dema ku di hilbijartinê 7’ê Hezîranê de têk çû wek Kartela sîneloa terorek dabû destpêkirin. Me ji bîr nekir, li Pirsûs û Gara Enqerê komkujiyên bi çi rengî pêk anîn.
Îroj ne bi hilbijartinek wek 7’ê Hezîranê têk çûye, bi têkoşîn û berxwedana Tevgera Azadiyê, têkoşîna hêzên demokrasiyê têk çûye. An jî negihîştiye armanca xwe ya plana qirkirina kurdan.
Di derûniyeke wiha têkçûyî û enkazeke siyasî de, di 14’ê Gulanê de diçe hilbijartinan. Dema ku di sala 2015’an de MHP li kartela xwe zêdekir, di heman demê de dewleta kûr û Ergenekon jî daxil bûn.

Lê îroj, ev hemû hêz bi du xelasiya xwe ketine. Heroj bi kêrên siyasî li hev didin. Hin kesên wek Sedat Peker û Muhamed Yakût ku bi salane di kartela wî de bûn li dijî wan heroj îtirafan dikin.
Ji bo vê yekê Erdoganê ku têkçûneke siyasî dijî bi serê xwe ma ye. Endamên kartelê yên ku encamên 14’ê Gulanê dibînin yek bi yek wî terk dikin. Herî dawî kesek bi nave Alî Yeşîldag di îfadeyên xwe de, Kartela Erdogan di dema xwe de ji kasa Tirkiyê çawa pere bidestxistî yek bi yek rêz kir.
Kurtasî hêzek wî ya ku bi terorê têkçûna xwe bide seknandin nemaye. Li Erziromê li hemberî Ekrem Îmamoglu hewldanek yan jî ceribandinek çêbû, lê neçû serî. Çima neçû serî? Hin hêzên ku ji kartelê dûr ketine û bi muxalefetê re ketine nav kontaktê, têkiliyên xwe yê berê bi kar tînin û detayên ku bi dest dixin bi muxalefetê re parve dikin. Ji Ekrem Îmamoglu re detayên provaksyoneke çawa wê pêk were ji berê de hatibûn şandin.
Hetanî hilbijartina wisa dixuye wê nikaribin bi kaosek têkçûna xwe bide seknandin. Piştî hilbijartinê jî zarok û zavayên wî jî tê de wê tu kes di kartelê de nemînin. Erdogan, ji bo ji Tirkiyê baz bide wê ji kartelên xwe yên navneteweyî alîkarî bixwaze.